Newroz Hejmar(65) Rûpel (8) Berçile 2005z – 2617k

Xweşiya We Hêviya Me Ye

Nameke vekirî ji hozanê gelê kurd Şivan perwer re

Dîlan Zivimgî

Piştî rêz û silavan .. Li dawiya Çiriya paşin , sala – 2005 – an , ew nûça bi êş û jan ya nesaxiya xoşewîst û hozanê hunera kurdî , birêz Şivan perwer gihabû me , xem û qusaweteke mezin xiste dilê tevan ku , li beramberî evqas sal , mirovekî mîna Şivan perwer , di merc û hoyên zor dijwar de , ewî bi serbilindî doza gelê xwe , ew doza çiqas rewa û dadimend , bi deng û awazên xwe yên xweş û şêrîn karîbû li seranserî Kurdistan pêdarî û pêwîstiya evîna welat di hiş û ramanên keç û xortên me de di riya stiranan re biçanda . Giringiya huner , ziman û dîroka kurd bi şêwakî zanistî ji xelikê cîhanê re, we karîbû şirove bikira . Bêgûman, bixêra hunermendên mîna we, huner û kultora kurdî hate vejîn .

Di warê pêvajokiyê de , roj ji rojê reng vedide , wisan jî , îro nirxê huner û hunermend cihekî bêlikirî , di nava gel de girtî. Lê, daxwaz û hêviyên me , ku hemî partî û dezgehên me nemaze hikumeta Kurdistana federal , xwedî li hunermendên me derkevin û tiştine girîng û pêwîst weke sendîqan(نقابات) ji wan re ava bikin .

Li dawî , em ji hêla xwe ve wek rêxistineke jina Kurd li Helebê ya parta Yekîtî ya Demiqurata kurd li Sûriyê " Yekîtî" û bi navê hemû heval hogir û berketiyên Şivan perwer xweşî û saxiya we hozanê gel Şivan perwer dixwezin û gurzek gulên renga – reng diyarî we dikin . Hêvî û daxweza me ji Xwedê yê dilovan , ew e ku , win careke dî li hembêza gelê Kurd vegerin û bi hêviyên pir bilind xebata hunerî bi dengê we yê xweş û zîz bajon serî .